# ÇEND BERPERÊN KURDOLOJIYA DI PÊŞANGEHEKÊ DE

*Bavê Havî*



Bi çavdêriya rêzdar Temer Remezan û bi helkevtina salvegera 13 ya danana tîpa Kurdistan ya hunerî li Duhokê, rêzdar Fazil Omer serokê civata parêzgeha Duhok, pêşangeheke erşîfî ya taybet ya çarê bo hunermendê rojnamenivîs Şivan Tewfîq li 10/10/2005ê li hola Şehîd Selman vekir.

Ev pêşengeh e ku ji komeke wêneyên fotografî yên dukomentîbûn, çend aliyek ji dîroka gelê Kurdistanê ji destpêka salên bîstan bi xwe ve kirtibû.

Li dor vê pêşangehê hunermend Şivan Tewfîq bo me got: “ Bi rastî min gelek mandîbûn bi vê pêşangehê ve dîtiye heta şiyam vî erşîfê meziné û wêneyên dukomendî kom bikim, ez li hemû parêzgehên herêmê geryam û çûme Îranê û hejmara van wêneyan digehe 200 wêneyan. Merema min a serekî ji vê pêşangehê ew e ku her kesê seredana vê pêşangehê bike, bizanibe ku kurd jî bi belge xudan dîrok in”.



